

# NÛBIKARANÎNA METIRYALAN LI SER XÊRA ME GIŞTAN E

Her cara ku tu rojnameyekê yan pakêtekê didî navenda vegerandinê rûdaneke girîng diqewime.

## VEJARTIN

## ODEYÊN GEMARÊ Û NAVENDÊN VEJARTINÊ

## ZANYARIYÊN ZÊDETIR

Doşeka kevn dibe rûpeleke hesinî ji bo erebeyê. Wek mînak besteyeke pûdreya kincşûştinê dibe pakêteke pîtzayê. Rojnameya dûravêti dibe rojnameyêke nû. Bi vî rengî madeyên xwezayê yên xav careke din têne bikaranîn û enerjîyêke zêde tê salifandin. Bi xêra vî karî, em gişt alîkariyê dikin ku cîhan bibe cihekî baştir ji bo jiyane.

Bermahiyên xwarinê weke biyogaz û kûdên biyofertilzer têne vejartin û bermahî dibe kareba û germahî. Hemî kaxezên bestebendiyê û rojnameyên xwendî û dûravêti têne berhevkirin û bo navenda nûbikaranîna madeyan têne barkirin da ku bibin kartûnên nû ji bo bestebendiyê yan berhemên din. Wek mînak renga bestebendiyên plastîkî bibin madeyên navxweyî ji bo kêseyên hilgira amûrên plastîk û feraxên veqerbar. Feraxên şûşeyî û kartûnên pakêtan di pileya yekem de dibin madeyên nû ji bo pakêtkirinê. Bestebendiyê hesinî dikare bibe rînga erebeyan û rojnameyên xwendinê dikarin bibin kaxezên pêjgehê û kaxezên rojnameyên nû.

Bermahiyên xwarinê û bermahiyên zêde divê hûn bikin nava çopên taybet ên nêzî xwe, weke mînak di odayên gemarê de. Eger hûn nikarin bestebendî yan rojnameyan di cihê gemarê xwe de dayînin, divê wan di navendên vejartinê de dayînin. Li vir ferax ji bo hemû bestebendiyên hene: Plastîk, kaxez, hesin, şûşe û pîraniya rojnameyan. Besteyên mezin ku li cihê jiyana we bi cih nabin hûn dikarin di navendên vejartinê de bihêlin.

Li malpera me bi adresa [www.sopor.nu](http://www.sopor.nu) her wiha hûn dikarin nêzîktirîn navenda nûbikaranîna madeyan peyda bikin û demên nobeta din a valakirin û paqijkirina wê derê bibînin. Hûn li vir dikarin rênimûniyên birêkûpêkkirinê, vîdeoyên vejartinê, nîşe û pêşniyarên li bara vejartin û cidakirinê peyda bikin.

Heke li bara zibil û vejartinê pirsên we hebin, hûn dikarin ji şaredariya xwe re telefon bikin. Ew her wiha dikarin pirsên we yê li bara zibilên hişk, kompost, zibilên elektrîkî û hwd. bibersivînin.

# CIDAKIRINA ZÊDETIR A METIRYALAN!

**Ji bo ku em bikarin îmkana nûbikaranîna kils û zibilên zêdetirê dabîn bikin, em hewcedarê alîkariya we ne.**

- Zibilên cida tevlihev nekin.
- Bermahiyên xwarinê tenê divê di kîsikên taybet ên ku ji bo wan hatine çêkirin de bi cih bikin.
- Wate diyar nînen.
- Tevahiya bestebendiyên divê ku vala û hema bêje hişk bin. Bestebendî û pakêtên ku madeyên din jî bi wan ra hene, divê li gorî madeya ku fikir dikin pirtirîn giranî ya wê ye, bîn cidakirin.



- ✓ Bermahiyên mêwe û pincaran, çaya kîsikan, tilp, qehwe, qalîkê hêkan, hestî û hew. her wiha hinek destmalên kaxezi werin bikaranîn.
- ✗ Plastîk, cixare, enfiye, gul û mûm zibilên xwarinê nînin.



- ✓ Qab, qutî, telîsên plastîkî, bestebendiyên ku dubare tijî dibin, tiyopên plastîkî, telîsên çîpsan û Lastîka îsfencî (Styrofoam). Serbend û devikan rakin. Telîsên bestebendiyên xwe yê plastîkî ji nava şûna taybet vala bikin; Bi awayekî ku her kîjan cida be. Bi vî rengî hûn cidakirina metiryalan ji bo qonaxên din hêsan dikin.
- ✗ Berhemên plastîkî ku ji madeyên pakêtkirinê nînin, wek mînak kenepê û pêlîstok wek zibilên mezin an bermahiyên navmalê cida bikin. Qab û şûşeyên vala bidin firoşgehan û pereyên berdêlê werbigirin.



- ✓ Qutiya konservan, qutiyên vala yê sperî, Tiyop, derî û doşek, qab û qutiyên rengan ên vala. Deriyê qutiyê konservê lêviktûj bitewînin.
- ✗ Qutiyên bi reng an label wek madeyên bixeter cida bikin. Hesinên rizî, borî û pêvekên av û rêjavê, tabe û tiştên din ku wek bestebendî nayên hesab, divê wek zibilên gir an zibilên navmalê bîn radestkirin. Qutiyên vala bidin firoşgehan û berdêla wan werbigirin.



- ✓ Qutiyên ava mêweyan, şîr û makarne, telîsên kaxezi qutiya solan, boriya parçeyê destavê û kartûnên kaxezi. Bestebendiyê saf bikin û bitewînin ser hev. Bestebendiyên biçûk dayînin nava bestebendiyên mezintir da ku cihê kêmîtir dagir bikin.
- ✗ Pakêta nameyan bavêjin nav zibildankên navmalê yan zibildankên ku têne şewitandin. Rojnameyên dûravêtî, belgêyên reklaman û yê weke wan bavêjin cihê taybet ê rojanmeyên betal.



- ✓ Rojname, kovar, heftename, katalog, bruşûr, belgêyên reklaman, lînivîsk û kaxezi nivîsîn û dizaynê. Beriya dûravêtinê, kaxezi çapî yê telîsê plastîkî yan kaxezi reklaman ên girêdayî bi wan bîn cidakirin.
- ✗ Pakêtname û pirtûkên bi cild bavêjin nava zibilên navmalê yan zibilên ku têne şewitandin. Telîsên kaxezi yê kîrîrî, kartûn û tiştên wiha bavêjin nava cihê wan ê taybet.



- ✓ Qab û şûşeyên bêreng û rengdar. Serpoş û devikan rakin û li gorî wan metiryalan cida bikin. Feraxên şûşe yê rengî û bêreng bavêjin cihê taybet.
- ✗ Qabên ku pereyê berdêla radestkirina wan heye bidin firoşgehan û pereyê wan bistînin. Feraxên çînî, siramîk û cînsên din ku bestebendî nayên hesab, divê weke zibilên mezin an zibilên navmalê bêne radestkirin. Lampe û çira divê radestî navendên ku kedkarên nûbikaranîne li wir hene bêne kirin.



- ✓ Kinc, paket destmalên feraxşoyê, firçe û piç û şeh.
- ✗ Ti tiştêkî vejartinê nabe di nava zibilên giştî de were bicihkirin! Zibilên talûkedar û zibilên elektrîkî jî nabe di kîsikên zibilan de bi cih bibin, divê hûn wan dayînin navendên vejartinê.

**EM SIPASIYA WE DIKIN!**

**sopor.nu**  
Sveriges avfallsportal